


ALAN OSMAN

DERDO

HELBEST

L.
4

Institut kurde de Paris



to you
with my best regards
for your remarkable
work. to express

ALAN OSMAN our pain-derDO
Alan Osman

18-9-1997

~~ALAN~~ 2

DERDO

Institut Kurde de Paris



HELBEST

DÎYARÎ

ev helbest

tenê bo ----

xwîna pakrewanên

Kurdistanê diyarînin .

STÊR

stêra kumika sêwîyan
buhira çete w rêwîyan
demsalên jîna te
ji qûma hîcazî raxistînin
gulzarên mejîyê te
ji qata yemenî çandînin
li ser rêka kadizan
ji komika sêwîyan
tu xûneke kurdi dinisili
werrê bêdeng
di tayê de diqilqili
li nav çeteyan
di tenayê de dişerpili
sîwana te ji mêj de tarîye
li ser benderên solan
şal û şapikên bi xûn
fire fire vegirtîye

pencerên te dergehên te
ji şûnîyê re vekirîn
nalên ciwanî-hespekî
pêlavên mendalekî
û rextê canbazekî
bi wan ve daliqandînin
û çavên te
kovîyan dibarînin
û gîya hişke
mîna xûnê reşe
erê û hûn
ey kujerên kovîyan
de bihêlin bihêlin
bera kovî biçêrin
bera gulle bera xencer
di noqan de bimînin
nîşanên civata merovatîyê
bimînin bimînin
bes tenê bihêlin bihêlin
bera kovî biçêrin

rêka wan pîrr dûre
hawîrdora wan zûruzûre
û ew mijûlin diponijin
li panavên mejîyan
dûrbûnan dipîvin
rûtkirî bê çek
di cengên ramanan de
di nav ar û dûmanan de
wan kurtdikin dikujin
û Qertel
ji doxên xenceran
ji şopên gulleyan
dilopên navdilan
gulavên sorgulan
dialêsin dimijin
dialêsin dimijin

GIRNÎJÎN

bes tenê ji te re
lêvên min bendewarin
ey girnijîna
li malzaroka hêvîya avis
di girêkê de
di qalikê hêkê de
tu hatîyî-
givaştin----- pêçandin ?
ji canên kuştîyan
ji xewnên birçîyan
ji hêrsên sêwîyan
tu hatîyî-
veristin----- hûnandin ?
ez jî yekê evîndarim
ji te re ez bendewarim
ey destpêka kenê min
û girnijîn

ji pênc xûnan saz dibe
û ken
ji pênc gîrnijînan endaz dibe
êdî bese de weri
lêv qerimîn ji te re
çav werimîn bi te re
ey destpêka kenê min
kêdera min-----jêdera min .

Institut kurde de Paris

PAKREWAN

wa dayê
dilopeke xunavbûm
ji xunceya çavê te weşîyam
dilopeke xwêdanbûm
ji deryaya enîya te fûrîyam
ramaneke kurdîbûm
ji damarên mejîyê te pekîyam
di ser latên ruwê te re
di qermîçokên axînan re
gindirîm-----meşîyam
ketim sîtila hinavê
li ser tînên birînan
kelîyam-----kelîyam
li asmanê çavên te
bûm keskesoreke xwezayî
ji evîneke pîrr sayî
ji jiyanê li jiyanê
vegerîyam-----vegerîyam .

ÇÎROK

hin zarok

bi dizî ji hev re kenîyan

ketin bêdengîyê girîyan

û bûn çîrok

ê poz jêkirî got :

di welatê min de

hûn dizanin ênku dimeşin

ser hildayî

poz bilind

pişt rast

çav şiyar

ziman netewefiroş

ew kînin ?

ê çav korkirî got :

di welatê min de

hûn dizanin ku

serên hildayî

ewin serên daqûlkirî
pozên bilind
ewin nikilên qertelan
piştên rast
ewin piştên kubikî
çavên şiyar
ewin çavên temirî
zimanên netewefiroş
ewin gûzanên perçeker
ji goştê welat re
ê ziman jêkirî got :
di welatê min de
hûn dizanin ku
serên daqûlkirî
bi sêpîyan ve tênrakirin
nikilên qertelan
di berateyan de cîdigirin
piştên kubikî
di gorran de tênrastkirin
çavên temirî

bi dengê topan tênhişyarkirin
gûzanên perçeker
di hestîyên welat de tênperçekirin
girî got :

welatê min daristaneke gwîzêye
û gûz bi şikandinê têyexwarin
û şaxên gûzan hew hew
ku şivikbin tênrastkirin
di şîrik de tênrastkirin
kenî got :

welatê min mûristaneke bin tehtêye
û mûrî tehtê quldikin
taku tîrêjan bibînin
bihna sinbilan hilmbikin

DÛNYA

Dinya ----- deryaye

li ser xûnê avaye

û pêlên xûnê-----

tevradibin ----diteqin

û kefên pêlan

kefenin sipînin

û laşên kurdan

li nav pêlan tazînin

* * *

suruşt û zor dizanin

ku çawan zarokan

li deryaya malzarokan

fêrdikin ---- avjenê

hawar ----- gidyano

gazî ----- xwedano

dinya kor û kerr e?

bes tenê -----

tabûtên dev vekirî

tên gazîyê ji me re !
axîn û bahoz şûre
axîn û pêl bilinde kûre
ne girînge -----
ev qayişe him qaşbûne
de werin -----
ey hêvîyên bêçareyan
ey pişkên dûvikan
peygirtîyên misilmanan
de werin -----
kerwanên islamê
gemîyên Ereban
kelekên Tirkan
qeyikên Farisan
hawar-----gidyano
temaşebikin de bibînin
ku çawan bê destûr bê peseport
sînoran dişikînin
hebûna me direvînin
diguhezînin welatên goştخوران
dinyaya kurmên bê diran ! ?

VIYAN

Ifyonkêş piştî serxweşyên xwe
haydardibin haydardibin
meynoş piştî mestbûnên xwe
hişyardibin hişyardibin
tenê tenê
noşevanên viyana te
li ser masa jiyana te
her dimînin navekişin
her dinoşin ne bêhişin
nikarin ku dilsarbibin
tenê tenê
diqîçqîçin bi te dikelin
pirr serxoş û dilhardibin
tenê tenê
diponijin bi te dibilin
bêtir mest û dildardibin .

DİLO

dilo dilo dilê min
kê got tu mirî dilê min
sedemê derd û kulên min
hemû deman tu sazband î
gurmugurma defa te tê
digel sazê tu dengbêjî
xuşuxuşa xwîna te tê
du rehên te çiq a xurtin
DICLE w FERAT çiq a xurtin
eger herdu ziwabûn
qaşo tu mirî dilê min

* * *

dilo dilo dilê min
Masîyên te zîzdibin
li bin gijlokan
li nav pêlan zîzdibin
stiranên evîndaran

xewnên birîndaran
stemên xak û asman
razên êşkenceyan
bi gilî dibêjin

* * *

lê ne xem e
pîrr guhedî bera pîrrbin
çem û newal bera pîrrbin
BEREDA EHWAR
KARÛN SÎHÛN
VOLGA MÎSÎSÎPÎ
RAYN DANÛB
bera hemû bigihêjin hev
bibin lehî bèn te dilo
ne xeme ne girînge
naguherin naguherin
masîyên xabûr û zab
masîyên dicle w ferat
naçin biyanî avan
nakevin nav xefk û davan

li pêş pêlan
li paş gjlokkan
seravî gerrînekan
ha vanin dimînin dimînin
merş û sirûdan dixwînin dixwînin

* * *

dilo dilo dilê min
û ha vanin dimînin dimînin
li ser enîya xewnan
xewnên beravêtî
li nav dengê pêlan
li zîzokên gerrînekan
nerrîna min tayek
mejîyê min çilabek
guhê min kelekek
ha vanin dimînin dimînin .

DEMSAL

-havîn:

derya di parzûnê rojê de
mûranin qalindin
di neynika asman de
çiyandin bilindin

* * *

-payiz:

fermêskên zêrîn weşîyan
ji nav şaxên kajîyan
û kajî
pûç û ziwa tazî
bi gazin bi gazî
li ber bayê tolazîyan
rûmetên wan qirçîyan

* * *

-zivistan:

kulîlkên berfê pişkivîn

çiyayên asman herifin
cok û rûbar herikîn
pêkve ketin çavên yarê

* * *

-buhar:

destên karkeran avisin
kefên destan qelişîn
pişikên ciwanî-hespan
ji sînga kawa pengizîn
pêkve ketin rehên darê

Institut kurde de Paris

MÛRİSTAN

recîma te hevgirtîye
di zozanê gewdê min de
di nav vêna milê min de
zîzdibe digerre
lê gelo tu dizanî çirre
li astaneya bê sînor
qurbanîya rojhilat
mêtingeha cîhanî
nabane nagivire ?
û damarên laşê min
paytexta recîma te ye
û xûna min xûna min
Gêrikeke
tevradibe disincire
tevzînokeke
disincire dixure ?

FINDIKÊ

di xew de min tu dîtî
kewareke mişt hingiv
te dixwar
li şeveqê min tu dîtî
li nav çîmenên gotinan
bi yarî tu kenîya
refeke mêşên hingiv
ji zimanê te firrîya
li kewara dilê min
cîgirt û banîya

* * *

di xew de min xwe dît
libeke zeytûnê min dixwar
li şeveqê min tu dît î
li nav lemên zilindarê
li ser textê şahînsahîyê
bi girî tu kenîya

bi fikandin ez kenîyam
çavên min bûn kewarek
hingiv ji wan rijîya
zimanê min bû darek
şaêeke zeytûnê ji wî kişîya
li defên guhên te da
de bese qurban
ma ne bese lêlê
evîna te dil dagîrkir
evîna min dil şahîkir
di dîwarê wî de yarê
min pencera xwe ronîkir

* * *

û dilên me
bê haybûn dilebitin
û findikên çavên me
dilop dilop dişewitin
de bera bişewitin
li cejna evînê bixebitin

* * *

AMED

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
dinya babilîsokeke serxweş û hare
xwegirtin di zîzokên wê de çetin û dijware
xweşî di bin sîtava wê de zilindare
rastî di nav pencên derewan de zarezare
merovatî di nav qîlên hovitiyê de bi haware

* * *

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
demsalên demê hatinin guherandin
demsalin nû hatinin aferandin
ev demsala te ne payize ne havîne
demsaleke nûye navê wê şewitîne

* * *

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
asmanê te daristaneke şewitîye

zemîna te tarîstaneke hevgirtîye
mejîyê te mûristaneke veşirtîye
dilê te gorrîstaneke xwekuştîye

* * *

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
de fêrbibî dinya mamostayeke fêrkere
dilovanî têde nenase bê devere
gelê navdar xwedan rûmet û buhayî
him berevane him kujer û cengawere
gelê bê nav ê nenas û ê windayî
paşmêrê dijmine an xewarê bê cegere

* * *

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
zanim ku tu nakevî ji dewranan
zanim ku tu natirsî ji diranan
çinku ji diranan tu pirr xurt tirî
gewdê te ji devan pirr mezin tirî

* * *

wa amedê li minê way ji minê de lê lê
xûnên te şilin li bîrin, li ber pozan
ji me re bûnin dozeke ji dozan
ha vanin dimînin dimînin
li çavnerrîna gerîlayên halanan
jibo stendina tola talanan
ha vanin dimînin dimînin

Institut kurde de Paris

MÊZOPOTAMYA

ne xeme xeman nexwî ne xeme
eger jî saw li ser lêv û dêmên te deqandin
eger jî çermê defa daweta te qetandin
eger jî qulên bilûra xemên te xetimandin
ne xeme ne xeme
ruwê te mûrane
berfeke zelale
ava amedê her dimîne
ruwê te akbatane
merovatî û heyjiyane
sirûda nûjyanê lêdixîne
gewrîya te
zilleke mêrgên êrîvane
hîrîhîra hespan dixwîne

sînga te
aram û deyane
keseran ji kaviên nînewa dikişîne
cangayên bi bask
li asmanê babilê difirîne

Institut kurde de Paris

HÎNGIV

xanima min
ji te re
min ser kirîye nimêjan
li ser tejbereke bizotan
ji dema ku şeveq dizêye

* * *

xanima min
hêvîkirin ku tu bibarî
li nav deştan
li ser zimanan
mîna berfeke buharî
û roj asîdbû
û havîn pijyayîbû

* * *

xanima min
lemeke zilindarê tu mayî
li nav deştan şaxê vedayî

xwe parastî bê fûrandin
û qûm diherikin dikelin
dipiçiqin dipiçivin

* * *

xanima min

û malhêkên dexsîyê

diçirrin dimirin

û kerîyên kovîyan

li nav çîmenên viyanê

keskesorên jiyanê

digerrin difirrin

û tu

xwedana min dimînî

va tu dimînî

ez dimînim

tu dimînî

ez dimînim

xanima min xwedana min

HESTE

tu kê bî
silav bo te
de rawestî
ha li vir rawestî
li ser qoqê ARARAT
li çep û rast binerî
li bej û avan binerî
ji kendal heya kendal
ji bender heya bender
gelo tu dizanî
tu dê çi bibînî ?
pûtekî ji heste
çavên wî ji atûn
pirç û biruwin gijbûyî
pozek ji bejna asman
lêvek bi diran gezbûyî
guhî bel û miçbûyî

tu dost bî an dijminbî
haybibî-----haybibî
heste dijîye ne bêcane
ne bes tenê kevire
ew jêdera agire
Arîye pîrozîye
li tarîstanan rewşene
li bin lêdanan çetine
bi hêrs çirûskan davêje
him şewate him mirine
kîn û dexsîyîyê dibrêje
haybibî haybibî.

DERDO

lo derdo

xwedan binyado lo derdo

bi danên xwe comerdo

* * *

lo derdo

li civatên te derdo

me cûtin û me cûtin

Qat û nezanî me cûtin

Benîştin pûçek me cûtin

em dicûn û me cûtin

* * *

lo derdo me sûtin û me sûtin

li şerrgehên tîrêjan

Lêzer Yoranyom

li asmanê heyvên deskar

çekin kevnar me sûtin

melhêb û das me sûtin

şûrin zingar me sûtin
em disûn û me sûtin

* * *

lo derdo
me dirûtin û me dirûtin
hawîrdora bejna te
pênc pîneyên gewdê te
bi diranên xwe derdo
bi damarên xwe derdo
em didirûn û me dirûtin

* * *

lo derdo
me dêran û me dêran
bênderên bawerîyan
li ber bayê xerdelê
li ber bahozên jehrkirî
em didêrin û me dêran

* * *

lo derdo
me hêran û me hêran

ew ramanên biyanî
stirî, kwîrik, zîwan
bi destarên mejîyan
em dihêrin û me hêran

* * *

lo derdo
me stiran û me stiran
bi xwîn û xwêdanan
me hevîrên xwe stiran
em distirên û me stiran

* * *

lo derdo.... derdo
di tenûra tayê de
tu birçiyî westîyi
birîndari ketîyi
di xew de
di xewnan de
di hişyarîya xapan de
nanê bawîbûnê tu dixwî
ava rewrewkan vedixwî

ax û axîn lo derdo
gelo kengî tu dê têrbibî
ji lukumandinan fêrbibî

* * *

û rêberên te reqin
hêdî hêdî dileqin
hin ji wan bûnin pût
li deşteke tazî rût
gorristaneke mişt tabût

* * *

hin ji wan dilerizin
bê sewdan dipengizin
ji sîya xwe direvin
li davên dijmin dikevin
wek keroşkan bezdonekin
pîrr dizên û tirsonekin

* * *

hin ji wan pêlewanin
li deryayan melevanin
li nav pêlan konevanin

li çiyayan nêçîrvanin
bi tabîyên xwe re firrokvanin
li ser kaşezan şerrvanin
bi gotinan ew sekvanin
lê dawî lo derdo
bo çilabên xinizîyê
bo davên keysbazîyê
ew nêçîrin ew qurbanin ! ?

* * *

lo derdo derdo
û tu bizanî
li beşçeyên aşîyê
darên zeytûnan
bê pelin tazînin
û gerdenên kevokan
bi şaxan ve darvekirî
kuştînin kuştînin ! ?

* * *

QAËBÛN

ji dûmanên jehrî
ji hinava zemînê
ji konê tarîstanan
li ser stûna xwînê
dexsokan dilên xwe qelaştin
berkanan çavên xwe givaştin
agir û stem hatinxwar
barîyan bê jimar
pêkve ketin livîna xanima min
ew liba genimî
şûrê birûskan hejîya biriqî
dengê birûskan şirqîya xeniqî
û xanima min
sinbileke zêrîn jîya
di nîva lat re fiqîya
bi çavin somerî
bi lêvin mîdî
bi dêmin kurdî

DÎNÊ ME

wa kevokê
dinya me valayîye
û valayî tije bayê sore

* * *

gazî hawar
de tu baskên xwe vekî
li gora astaneya welat
li gora jimarên zinzaneyan
odeyên êşkenceyan
me sî ji te divête
himbêz û dilovanî
lûs û palvedanek
li bin sîtavên perrên te

* * *

de tu nikilê xwe vekî
ligora pîvanên tîbûnê
zordestî birçîbûnê

belkî --

ji nikilê te

libek----- dendikek

ji çavên te

dilopek----- rondikek

* * *

û dinya me valayîye

û valayî tije bayê sore

û xûna me berfeke şore

dînek di xwe de girtîye

bê hiş tevizandîye

de tu rabî

dînê me yo tu rabî

tu çendî----- hişmendî

demaku tu dîndîbî

disincirî----- bi tîndîbî ! ?.

XWÎNA TE

hezdikim bibînîm
ewrên kêfê bixwînîm
hûrik hûrik bikenin
li ser lêvên asmanê te
erê birîna vekirî
erê ----- erê
xwîna te ewreke xuyaye
bi asmanê te ve xwe berdaye
bi kotekî kun teqyaye
lê dizanim baş dizanim
kîjan çaroxê kun teqandîye
ji wê re
çar rû û rengêk henin .?
û qeytaneke bi tenê
wan li hevdû dicivîne .?
û lingekî bi tenê
çaroxê dilivîne . . . ?
û xwîna te
ey birîna vekirî----- ?????

TOL

xûnên nivîsokan
meyandînin çîqa sarin
dengê kurdên xiniz
di kewarên kurtêlan de
benckirînin pîr xewarin
û rûplên ruwê te sipînin
sîng vekirî bendewarin
û ruwê te
stirîyekî zixtoke
li nav kaviîlê gewdê min
seyrançîye-----geroke
û ruwê te
xûn ji min micîqand
tif ji dijmin micîqand
tifê xûn birîqand
û coka xûnê -----
coka tifê xeniqand

gola cokan bû xelekek
û gewdê min -----
bo ruwê te
bo razên evîna me
bû kelekek-----?
û ruwê te
ma ola min
ma armanca tola min

Institut kurde de Paris

zinzane

1993

GÎXE BIVE

dem şeveqe
li zindanê roj girtîye
û dinya
Kevokeke reşe
gerden şikestîye
li ser sînga dayikê
sêpîyek vegirtîye
di bin de zarokeke
çut rawestîye
pêçeka wî sipîye
li ser sîngê kaşezeke
gunehên wî bi xêzkirin
hatininrêzkirin
ev zarokekî xinize
nokere çeteye dize
ji biyanî fêrdibe dipeyive

1- giê giê

bive bive

2- giê giê

titê titê

dada çîço

çeç çeç bavo

3- giê giê

kixe kixe

Asêna Mar

Pêxwas keftar

bive bive

kixe kixe

4- giê giê

wîşik wîşik

zarokê xweşik

* * *

Qur'an hatexwendin

xwestek hatexwestin

giê giê

werîsekî rengîn min divêt

kesk û sipî sor û zer
werîsê çar reng
bi lez bêdeng
bi sêpîyê ve hatedaxistin
û zarok hatelidarxistin
lê zimanê wî
vezelîya ta dawî
bangkir li yek hawî
gîxe gîxe
ezim sînema Amûdê
ezim Elqesmê, Zêwe
xormal û helebçe
ezim ez ezim
natirsim de berdin
werîsê rengîn berdin
ey rênçberên sêpîyan
Faris û Tirk û Ereb
çandîyên mêtigeran
cîgirên wan rêwîyan
de berdin li nik me haweye

em zarokên sêwîyan
kumên me rengînin
memikên me rengînin
mirinên me rengînin
de berdî ez bi lezîm
li rojhilatê roj girtîye
bes tenê li gorristanê
bo min bi pêşwazîye ?

* * *

Institut kurde de Paris

BERF

asman dêwekî mirîye
kefenê wî sipîye
dinya tije perwaneye
sipînin difirrin
û destê daristanê hirçin
difiqin dikenin

* * *

li ber dergehê Amedê
Gerîla xefkan vedide
li çavnerrîna gurane
ji tayên tîrêjên rojê
Gerîla davan dirêse
ji berfê re nêçîrvane

* * *

li ser bênderên helebçe
temara gorrane
xwegezkirina harane

û şev tarîye dizeke
ji berfê re destike
û pêşmerge zêrevane

* * *

axîn birawo
dîsan barîyan
hirçên sipî barîyan
mamo berzo razandin
di kurkên xwe de pêçandin

* * *

li sikakên Akbatanê
Keftarin Exmînînin
kujerin bi kofînin
reşin keskin sipînin
di bin ala Huseynî de
xêlîya Necefi de
li nav bapêçên xinizîyê
êrîşdikin Mîdîyan

* * *

li ser sînga Qamişlo

pinpinîkên sipînin
hûrik hûrik dibarin
ji pûrta serên pûtên wê
Kund hêlînan dihûnin
ji kewarên serên wan
hêdî hêdî diçêrin

* * *

li zozanên Nexşicwan
bapêçeke Sîbîrîye
di sênîkên Farisî de
nexşicwan diçine
ji Qyser re ji Teter re
hênikdike him sardike

* * *

haybibî haybibî
berfe ev berfe
ji perwaneyên sipî re
Qîlên xwînî henin
Qîlên kujer henin !?

* * *

ZINDANE

zindane

ruwê dilberê zindane

û ez têde

sa xî mirî xwedan alim

* * *

viyane

êşkenceya wê viyane

û ez têde

ji ken û girî xwedan malim

* * *

jiyane

zilindara wê jiyane

û ez têde

stirîyên zilindaran

bi mijankên van çavan

bi ziman û hinavan

ji ser dêmên dilberê

dest bendkirî dimalim

* * *

halane

serê dilberê halane

û ez têde

li ser tîna serî xwedan palim

* * *

hêlane

rewşa dilberê hêlane

û ez têde

di vê demê de

li bin zemînê hay-jêbirî

çong di zik de deng-azirî

bê hevalim bê hevalim

* * *

BAWERÎ

gotin xwedanê te kîye
min got xwedan merovatîye
gotin ma ola te çîye
min got eve kurdîfîye
gotin û min got min got
kê xûna kurdî rijand ?
şîrê çilînî mijand ?
guhanê avisê dot û dot ?
gotin û min got min got
êku şûşeyên xûnê
berda dilê atûnê
hûkirê ta kir bizot û bizot
gotin û min got min got
kê têla hesin kişand ?
ruwê rojê veqetand ?

pênc bumbe xistin ber cot û cot ?
gotin û min got min got
êku xewnên zarokan
xistin devê babilîsokan
wî merovatî firot û firot !

Institut kurde de Paris

VÊN

jêdera jînê mirine
di welatê min de
darên mirinê şandînin
li her xaniyî çandînin
û gorrên kurdan
sinbilin genimînin
û deştên welat
çiyayên welat
hişkin pîrr tînin
û xûnên kuştîyan
halanên jinbîyan
vênên sêwîyan
kêferatên girtîyan
ewrin buharînin
baranin xunavînin

HELEBÇE

me pirsî li kuye
gotin bigerrin bibînin
li ser sînga kaşezan
li hindir dilê gotinan
çavên me guhên me
li hespên seran siwarbûn
bû hîrihîra hespan
ewan simên xwe sûtîn
heste kolan û vedan ?
gotin ha li wir dimîne
baskên xwe berdane
li jora wî ewrin
li jêra wî asmane
me hêvî girêdan
berê me kete banan
ji dûr de em dîtîn
çira xwe vemirand

çavên xwe dirûtin
me bangkir em kurdin
guhên xwe jêkirin
bi tilîyan kilîtkirin
lê zimanê wî li kare
hûdike ((AYETAN))
disincirîne disincirîne
û sîtila avê dikele
serên qurbanan xaçkirînin.
kişîyan serhildan kişîyan
sî milyon kevok
perpitîn bangkirin :
li ser bejna kêfa me
hêlînên tûpişkanin
raserî dergehên me
refên kundan meşelin
hawîrdora hêlînên me
marin zîyanin
li jora zozanên me
kerîyên hovanin

li ser şaxên jîna me
goşîyên kurmên mijokin
li mîzoya bayê me
mirinên rengîn
keskin zerin hişîn
dilop dilop dirijin
li beşçeyê asmanê me
lîstikin mêwên polayîn
rengo rengo diweşin
û zarokên me tînin birçîn
dilopên rengîn vedixun
mêwên polayî dixun
başê
çirre çavên asman korin
çirre guhên asman kerrin
eger babet qaşbûne
va em diçin çiyayê Nemrûd
ku fêrbibin berdana
tîrik û kevanan !?

PÊL

bawerbikî ji te hezdikim
û çirre na ?
çavên te pêlên rewrewkênin
di qulika kilîtê re
tên serdana min
ez jî werrê fêrbû mim
ji dema zarokî de
xewna min rewrewke
kêfa min rewrewke

* * *

bawerbikî ji te hezdikim
û çirre na ?
çavên te pêlên keskesoranin
ji pêlên keskesoran firrîyan
Qumrîyên te şalûrên te firrîyan
ketin pêlên nûrozê de
heyv û xaç lidora wan bûn girêdanek

di xana duwan de ji zindanê **
li asmanê dagîrkirî bûn nîşanek
û destûrên daristanê
leşkerên sînoran
Başoke Qertel
êrîşkirin bezîyan
bi harî pekîyan
û qumrîyên te şalûrên te
revîyan terqîyan
xwe avêtin taqa dil
dilê zarokekî bêguneh
û zarok
li ber dergehê zindanê
li nav pêlên dixanê
bi tirs digirîya
li ser cendekên kuştîyan
û leşkerên sînoran
Qaçorçîyên daristanê
êrîşkirin civandin
pêlên rondikan mijandin

sermiyanê bi tenê mayî
ji kanîyên çavên kelyayî
bi kotekî revandin
kenîyan vegerrîyan
û nikilên wan berkurkên wan
tije bêşa daristanê

* * *

û çavên me
pêlên sîmiranin
de sîmirno de
biqetînin wan davan
kostekên tirs û sawan
ji nav pêlên wan çavan

* * *

** zindana hesekê

MÛDÊL

gelek terzî civîyan
topên cawan civandin
ji wan cawên nexşkirî
bi heyv û xaçan
çakûç û dasan
pîrr mûdêl çirrandin
pîrr nimûne dirûtin
li bejna te gerrandin

* * *

lê ji min ve tu ma yî
biyanî tu ma yî
kirêt û gennî tu ma yî
rewşeke bê buhayî

* * *

hezdikim
ji bejna te hezdikim
ku

bi şal û şapik
pêşmal û qemçik
deling û fistan
hûçik û xiftan
kember û qolan
bimîne pêçayî girêdayî

* * *

hezdikim
ji serê te hezdikim
ku.... kum û koloz
şara kesrewanî
kofî û kitan
lidora wî
bimînin pêçayî berdayî
ku ji xwe ve avayîbûbe
kofîya wî badayîbûbe
ji pûrta kovîyan hûnayîbûbe
li xelekekê gerryayîbûbe
ligora astaneyaya te ??????

İSLAM

eger pêlavên pêxwasekî
eger şûrê kuştyarekî
eger dravên belasekî
li Mekeyê bên dizîn
destê dizek dê jêbibe

* * *

lê gelo gelo
eger welatewkî dagîrkiî
eger aşîyeke zincîrkiî
eger namûseke berbatkiî
li gora destûrên misilmanan
hatibinxistin bin talanan
ku qîrbikin dadwerîyê
jibo tol û rizgarîyê
lo kurdo lê kurdê
em dê çi bikin
çi bikin ! ?

Temeno

temeno----

liba genimê kelandî

dendika zeytûna şewitandî

çi çandî û çi --ne çandî

ey adîloşê li malzarokê xeniqandî

temeno

min tu xistî rêpîvanan

rêpîvanên xweşîyê

wan berê min da gorristanan

min Kêl xwendin li nav bêcanan

kêlek- ji zanê ta mirinê sed sal

kêlek- ji zanê ta mirinê sed meh

kêlek- ji zanê ta mirinê sed roj

kêlek- ji zanê ta mirinê sed demijmar

kêlek- ji zanê ta mirinê bê nivîstinbû

lê kêla xweşîya te temeno

ji min ve ma windayî

li nav gorran ne xuyayî

ZÎNZANE

tabûta min zinzana tek
dîwarên reş sar û şillek
cîhana kerr sîtava terr
pêkve li min bûnin xelek
deryê hesin saw û tirse
taqa girtî bayê kuştî
nahêlin jîn li min bipirse
taq û derî bi awirin
ku vedibin guh diçirrin
ji hinava dexsiya kevn
ji asmanê stema germ
tif û sixêf xurt dibarin
mîna teban hov û harin

* * *

tabûta min çîqa şenge
avayîyek mîz û jenge

ku.rûdînim qefes tenge
ku radibim qefes tenge
qefes tenge
raz bûn girêk tev ketin çerm
lê sînga min ma kela germ
ji gotinan ji sotinan
ku diteqe top û tenge
top û tenge
bi aramê pirr zengînîm
bi nalînan xwe d'lorînîm
divêm dema xwe b'bûrînîm
dem dibûre bê destûre
dem tarîye bê dawîye
nizanim roj nizanim şev
tenê zanim dem derenge
dem derenge

* * *

tabûta min gorra saşan
dêwê mirnê li her çaxan

pêwanên te canewerin
ne konevan û dadwerin
û lingên min tim bilindin
ji lêdanan çerm qalindin
li ber pozan li ber çavan
rawestînin li hemberin
di ruwên wan de enyên wan de
bi rûmetin bi cegerin
êşkenceya bin lêdanan
şîrqişîrqa xêzeranan
xew û xewnên min didizin
tevezînokên cereyanan
hestî ji wan zû dirizin
bin avkirna birkên avan
pişik ji wan gilî gazin
pêş dadweran ser nadînim
divêm çavên wan bişkînim
tev dibêjin ku serhişkîm
ji hovyê ne bê pişkîm

lê dizanim baş dizanim
ku ez kurdê kurdistanim
ku ez hişkîm wek rastîyê
li dij xapên Islamtîyê
gunehên min hemû evin
hemû yekin mîna hevin
çirre kurdim çirre kurdim
nivîskarkî şêwe sertim
dij zordestyê dij hovityê
bi xebatên xwe comerdim
dijmin divêt dozê berdim
divêt laşem tim windabe
ku canê min jê cudabe

* * *

tabûta min zinzana tek
girtin lêdan zor û kotek
tu Qanûna rojhilatî
demuqrasya her welatî
temenê te ne dirêje

zincîreke pîrr qirêje
bawerbikî dê hilweşe
xelek xelek dê biweşe
nav tabûta bédengîyê
nav dîroka bêbextîyê
orta berdên mêranîyê
hindir Aşê azadîyê

* * *

DÎLAN

ez û tu û çira
çirayê baskên xwe pelandin
li ser dîwaran
li ser tejikan
dîlanên xwe gerrandin
û ez û tu
çong şikandî
gerden çivandî
bûn govendên çirayê
li ser awazên çirçirkan
marmarok û tûpişkan
vingivingên mêşan
li bin derzîyên kelmêşan
em man ne westîyan
pilindiran teşîyên xwe ristin
li dora govendan tevnên xwe lidarxistin
û ez û tu ne westîyan

li nîvê şevê li destê sibê
em ne westîyan
em man man
baskên çirayê
kombendaneke semayê
û ez û tu
em ketin pey hev
em man roj û şev

Institut kurde de Paris

MIZGÎNE

mizgîne pêjna te mizgîne
ruwê te elendeke zêvîne
devê te xunceyeke xwînîne
surrin bayê elendê
buharînin hênikin
û lêvên min
zimanên çivîkin bejînin
tînin tenikin
mizgîne EWR mizgîne
ewrê kenî em nuxamtin
û em dûmanin
sipînin sivikin
û bihna kenî
masînin diherikin
de bihêlî

ewr dûmanan bicivînin
dûman hevdû biçivînin
ziman baranan birîjînin
ken hevdu bihejînin
de bihêlî bihêlî

Institut kurde de Paris

AZADÎ

azadîye
laşê te azadîye
ji razan çandîye
hezdikim nêçîrvanbim
li jora tilmên azadîyê
li dora delavên newalê
û delav sar û germe
û giya hûr û nerme
di nav de kewekî girtîye
dev vekirî qebeqebe
evîndarekî bi hêvîye
ku kilîta azadîyê
li zinzaneyê wî keve
de lê lê azadîyê
evîna min kilîteke
di kevanê min de tîrikeke
de hezbikî hezbikî

bera tîrik li kew keve
gewdê kewî di xew keve
û em tînin birçînin
de weri em bilezînin
goştê kewî bipijînin
li ser tîfika dilê min
di tîrikê evînê de
li ser pêtîyên dilê te
di zinzaneya pijînê de
û ez tîmim delalê
hinava min havîne
bes qurtekê bidî min
ji sarinca newalê
hinava te kelîne
de tu meyê binoşî
ji mey û bûza peyalê

Institut kurde de Paris

NAVEROK

- 1- stêr
- 2- gîrijîn
- 3- pakrewan
- 4- çîrok
- 5- dinya
- 6- viyan
- 7- dilo
- 8- demsal
- 9- mûristan
- 10- fîndikê
- 11- amed
- 12- mêzopotamya
- 13- hingiv
- 14- heste
- 15- derdo
- 16- qaşbûn
- 17- dînê me
- 18- xwîna te

- 19- tol
- 20- giçe bive
- 21- berf
- 22- zindane
- 23- bawerî
- 24- vên
- 25- helebçe
- 26- pêl
- 27- mûdêl
- 28- islam
- 29- temeno
- 30- zinzane
- 31- dîlan
- 32- mizgîne
- 33- azadî

ALAN OSMAN

evin pertûkên wî ên çapkirî:

1- rastî.... helbest

2- rêzimana kurdî

3- derdo.... helbest

4- felsefeya kurdî... çîrok

.....
.....

ji wî re li hêvîya çapkirinê

destnivîseke

(rêzimana kurdî) mezin heye.

dîwana - 2 - an

mafê çapê parastîye

çapkirina sala 1995 an


çapxana gormepaş



Institut kurde de Paris



DERDO



Liv.
43